

Dengdan

Roja yekşemê 26 Gulan 2019 hilbijartinê ji bo Parlamentoya Ewrûpayê tê li darxistin.

Val 26 maj 2019

EUROPAPARLAMENTET

Kê/Kî dikare deng bide?

Heger hemwelatîyê Swêdê yî û li nifûsa Swêdê qeyda te heye yan ji hebûye, wê demê mafê te yê dengdanê heye. Herweha mafê te yê dengdanê heye; heger ku tu hemwelatîyê yebk ji welatên Yekîtiya Ewrûpayê yî, li nifûsa Swêdê qeyda te heye û te xwe di lîsteya hilbijêran de nivîsandîye. Herî dereng roja hilbijartinê divê te emrê 18 salî tije kiribe.

Kesên mafê wan yê dengdanê heye karta dengdanê werdigirin

Tu yê ku xwedî mafê dengdanê yî, dê ji te re sê hefte berya hilbijartinê bi rêya posteyê karteke dengdanê bê şandin. Li ser karta dengdanê nav, adres û demên mesayıyê yên lokala hilbijartinê ya te hatîye nivîsandin. Herweha pêşnîyaza lokalên ji bo dengdana pêşdemî [fôrtidsröstning] ji li wir hene. Heger karta dengdanê ya xwe wenda bikî dikarî yeka nû li cem şaredarî (belediye) yan ji Daîreya Hilbijartinê ya Navendî (Valmyndigheten) sparîş bikî.



Pisûleya dengdanê

Pisûleya hilbijartinê li hemû cîyên dengdanê û li cem partîyan hene.

Dengê xwe bide partîyek

Berya her tiştî tu dengê xwe didî partîyekê. Navê partîyê li ser pisûleyê hatîye nivîsandin. Heger nikarîbî pisûleya partîya xwe peyda bikî dikarî navê partîyê li ser pisûleyeke hilbijartinê ya vala binivîsinî. Bi awayeke xuya û zelal binivîsine.

Dengdana kesan

Heger dixwazî namzedeke xisûsî ya partîyê bê hilbijartin, wê demê dikarî di pisûleyê de çeprazek li çargoşeya li pêş navê namzedê xêz bikî. Tu dikarî tenê namzedek çepraz bikî. Herweha dikarî bi vî awayî ji dengê kesî bidî: navê partîyê û namzed li ser pisûleyeke vala binivîsîne û dengê xwe bide.

Dengdan

Roja 26 gulanê di lokala hilbijartinê ya xwe deng bide

Tu tenê dikarî li wê lokala hilbijartinê ya ku navê wê li ser karta hilbijêran ya te hatîye nivîsandin dengê xwe bidî. Lokala hilbijartinê tenê roja hilbijartinê vekirî ye. Dema li lokala hilbijartinê ya xwe deng didî navê te yê di lîsteya (kutuka) hilbijêran de tê çeprazkirin û dengê te dixin nav sendoka hibijartinê.

Li şaredarîya xwe yan ji li şaredarîyeke din pêşdemî dengê xwe bide

Tu dikarî li seranserê welat li hemû lokalên dengdanê pêşdemî dengê xwe bidî. Dengdana pêşdemî derdora sê hefte berya roja hilbijartinê dest pê dike û hetanî dawîya roja hilbijartinê berdewam dike. Agahîyen li derbarê ka li kîjin cî û deveran dikarî pêşdemî dengê xwe bidî li cem şaredarîya xwe yan ji li ser malpera www.val.se dikarî peyda bikî.

Dema dengê xwe pêşdemî didî divê karta hilbijêran [röstkort] ya xwe bi xwe re bibî.



Valmyndigheten

Ji derveyê welêt dengê xwe bide

Heger tu li derveyî welêt û, dikarî bi rêya posteyê dengê xwe bidî yan ji li cem gelek balyozxane û konsolosxaneyên swêdî dengê xwe bidî. Ji bo karibî bi rêya posteyê deng bidî divê tu ji Daîreya Hilbijartinê ya Navendî [Valmyndigheten], şaredarî, balyozxane û konsolosxaneyen materyalên xisûsî sparîş bikî.

Alîkarîya ji bo dengdanê

Dengdana bi rêya wekilek

Heger ji ber nexwesi, kêmâniyên fonksiyonî yan ji temenê bilind nikarî bi xwe biçî lokala hilbijartinê, wê demê dikarî bi rêya wekilek deng bidî. Herweha heger li nezaretxane yan ji li girtîgehê yî dikarî bi rêya wekilek deng bidî. Ji bo dengdana bi rêya wekilekê divê tu ji şaredarî yan ji Daîreya Hilbijartinê ya Navendî materyaleke xisûsî sparîş bikî.

- Ev kes dikarin wekîl bin:
- mîr, jin yan ji hevjîn[sambo]
- zarok, nevî, dêubav yan ji xûşk û birayê mîrî, jinê yan ji hevjînê
- kesen ku bi awayeke pişeyî lînêrîna te dikin yan ji di meseleyên şexsî de alîkarîya te dikin
- xebatkarêni li nezaretxane yan ji girtîgehan

Wekîl divê bi kemasî 18 salî be û karibe karteke nasnameyê ya xwe nîşan bide.

Wergirê dengan yê gerok (seyyar)

Heger ti kesek ku ji te re bibe wekîl nasnakî, wê demê şaredarî dikare wergirek dengan ku tê mala te peyda bike. Ji bo agahîyen zêdetir bi şaredarîya xwe re têkilî deyne.

Divê tu nasnameya (hewîyeta) xwe îspat bikî

Ji bo karibî deng bidî divê tu nasnameya xwe îspat (piştrast) bikî. Heger wergirêni dengan te nasnakin divê tu belgeyeke nasnameyî yên wekî karta ajotinê (ehlîyet) yan ji pasaport nîşan bidî. Heger belgeya nasnameyî ya te tunebe kesek din dikare nasnameya te tesdiq bike. Lî wê demê divê ew kes karibe belgeyeke nasnameyî ya xwe nîşan bide.

Teqwîma hilbijartinê ya Yekîtiya Ewrûpayê ya 2019

| | |
|----------|--|
| 11 nîsan | Tarîxa herî zû ya ji bo şandina dengan bi rêya posteyê ji derveyê welêt |
| 26 nîsan | Mafê dengdanê ya te, li ser bingehê agahîyen di qeyda nifûsê ya Daîreya bacê, tê xuyakirin |
| 2 gulan | Tarîxa herî zû ya dengdana ji balyozxane û konsolosxaneyên swêdî yên li derveyê welêt |
| 8 gulan | Dengdana pêşdemî li Swêdê dest pê dike |
| 26 gulan | Roja hilbijartinê |